

Qasim Sulêmanî û kerê mele Nesredîn

»»» R:7



Stêrka Geş a Kurdan

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duhestînameyek Siyayî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (414) 21-01-2022 Buha (1000) Tûmen

Paşeroja nasîyonalîzma Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê de

»»» R:4

Dijberên du zimanî çi dibêjin?

»»» R:5

Rêz ji rûmeta gel hat girtin

Li rêkefta 30'ê Be-
franbara 1400'an a
Rojî, li binkeya sereke
ya PDKÎ ya li bajarê
Koye, bi hilkefta cejina
2'ê Rêbendanê, 76'emîn
salroja avakirina Ko-
mara Kurdistanê bi
beşdariya rêberateyîa
PDKÎ, kadr, pêşmerge
û malbatên serbilind
yên, rêûresmek birûmet
hate lidarxistin.

Rêûresm bi xwandina
serûda "Ey Reqîb"
û ragirtina bîstek
bêdengî bona rêzgir-
tin ji canê pak yê tev
şehîdên Kurd û Kurdis-
tanê destpê kir.

Piştîre ji aliyê koma
birêveberiyê ve,
xêrhatin ji amade-
bûya hat kirin, û her-
wisa ji aliyê "Hesen
Şerefî" Cihgirê Yekem
yê Lêpirsyarê Gîştî
yê PDKÎ û herwisa
Berprisê Navenda
Siyasî ya Hizbê ve,
gotarek bi vê hilkeftê
ji amadebûyan re hat
pêşkêşkirin.

Rêzdar Şerefî, di
axavtinên xwe de
behsa girîngîbûn
û pêgeha dîrokî ya
Komara Kurdistanê
û destkeftên Komara
Kurdistanê kir, û îşare
bi girîngiya Komara
Kurdistanê di rewşa
siyasî ya vê serdemê
de û herwisa hizir û



ramana pêşkevtiyane
ya Pêşewa Qazî Mi-
hemmed derheq pîrsa
neteweyî û afirandina
rewşeke tevav de-
mokratîk kir ku piştî
derbazbûna 76 salan li
ser xebat û têkoşînê re,
dibînin ku her ser-
demiyane û bi awayekî
berdewam dirêjederên
rêya Pêşewa Qazî Mi-
hemmed di vê çepera
tijî serbilindî de ne.

Herwisa navbirî di ax-
avtinên xwe de got ku:
2'ê Rêbendanê ji ber
vê yekê bo me girîng û
pîroz e, çimkî jibîranî-
na serkevtin û bideşt-
veanîna destkevtên
mezin ên dîrokî yên
neteweyî û demokratîk
e, ku ev her evane eger
yê her neteweyeke

din bana û bi hindek
taybetmendiyên bijartî
ku heye gelek zêdetr
û bi hizirek kûrtoir dê
ev rêûresmên han lidar
bixistana.

Herwisa got jî: Em
dibêjin ku Komara
Kurdistanê mînak û
bijarde bû di dema
xwe de, bi vê wat-
eyê ku desthilateke
neteweyî di cihekê de
li dijî her neteweyekê
serî rakir û demokrat
bû di halekê de ku, ti
cihek ku demokrasiya
bi vê wateyê tunebû û
dijberiya vê jî dihate
kirin.

Cihgirê Yekem yê
Lêpirsyarê Gîştî yê
PDKÎ di beşeke din
a axavtinên xwe

got: Yek jî mezintrîn
nîrxên ku Komarê em
hînî kirin ev e, dibe ku
em bona liserxistina
xebata xwe fidakariyê
bikin. Û hêviya vê
yekê dixwazim ku,
ev hizba li ser milê
tev ciwanên neteweya
Kurd digel girtiyên
siyasî û kêmendaman
e, li ser hev bi taybet
mîrathilgirên raşteqîne
yên hizba avaker ya
Komara Kurdistanê,
xebatkarên PDKÎ hem
dibe bizanin ku mîrata
kê ne û hem bizanin
çawan dibe qedrê vê
dîrokê bizanin û dibe
bizanin çi bikin û her-
wisa vê yekê jî bizanin
çawan em şanaziyê bi
derbaziya tijî li ser-
bilindî ya xwe dikin
û her bi hemên awayî

nifşên bên çawan dibe
şanaziyê bi xebeta
nifşa niha bikin.

Herwisa peyama
hevpar ya rêkixstînen
wek, Yekîtiya Ciwa-
nan, Yekîtiya Jinan û
Xwendekaran, ji aliyê
"Vahid Ehmedî" ve
hate xwandin.

Di beşeke din a vê
rêûresmê de koma
mûzîka Hêza Pêşmegê
Kurdistanê çend stran
pêkêşî amadebûyan
kirin.

Herwisa amadebûyan
rêûresm bi lidarxistna
govend û dîlanê dawî
pê anîn.
Hemû salan di sal-
roja avakirina Ko-
mara Neteweyî ya
Demokratîk a Kurd-
istanê de, û di cihên
cuda ên Kurdistanê
de çalakî û rêûresmên
cuda tên lidarxistin,
rêz ji vê yada birûmet
ya neteweyî tê girtin.
Îsal jî bilî belavbûna
çendîn peyamên
pêwendîdar ên weke,
peyama Navenda Si-
yasî ya Hizbê, peyama
Navenda Hevkariyê
ya Partiyên Kurdistanê
Îranê, peyama Yekîtiya
Zanayên Olî ên Kurd-
istanê, peyama xebat-
karên demokrat û tev
serbestxwazên Kurdis-
tanê, ev salroja mezin
bilind ragirtin.



N: Kerîm Perwîzî

Ez di nîveya duhem a dehika Rojî de, digel komek ji hevalên xwe ku qet nayêne jibîrkirin, li Zanîngeha Tehranê mijûlê xwendinê bûm û di wê demê de jî car caran çalakiyek Kurdane bi rê ve diçû ku hin caran wek temaşevanekê em tê de beşdar bûn û hin caran jî me hevkarîya birêveçûna wê dikir. Ger ez şaş nebim qîrçar wisa bû ku yek ji wan rêûresmane li salona sînemaya Feleştînê ya Terhranê bi rê ve here, destpêkê dezgeha hikûmetî îzna birêveçûna wê neda û piştîre bi destkarî û bi wergirtina hin soznameyan wan îzn da û bi rê ve çû. Li vir û di nav beşdarbûyan de ez digel hevalekê xwe mijûl bûm ku çi min du jin dîtin ku yek ji wan temenê wê gelek li serê bû û ya din kêmtir. Hevalê min got tu wan nas dikî? Min got na. Got eva Mîna Xanima hevjinê Pêşewa û ya din jî yek ji keçên Pêşewa ye.

Ji nişkê ve bêhna min nedihat, her du çavên min jî teji bibûn ji rondik, ne dihatine xwarê û ne jî diçûne nav. Tenê ya ku bo min hate kirin ev jî maçkirina destê yekem jina Serkomarê Kurdistanê bû û ez bi bédengî rûniştim û di vê navberê de tev ev dîroka ku min li ser nîştima xwe xwendibû û yan bihîstibû hatine berçavê min heta giha bi wê roja ku leşkerê koloniyalîzma panîranî hate Mihabadê û Pêşewa û du rêberên din îdam kirin!

Hin çirke di jiyana mirov de hene ku mirov li wê cih û demê de namîne û di vê demê de gelek cih û dem dikarin bêne nav mêjî û bîrkirina mirov û li vê cihê mebest xwe bibînin. Di vê demê de ez li meydana Çarçirayê raw-

Tîrêja Ronahiyê



eştabûm û min mêzeyê sê rêberên Kurdistanê dikir ku termê wan li ser dara îdamê qahîm û xweragir rawestabû. Pêşewa çû ser darê û bû bi remza hermana Kurd û Kurdistanê û Şahê Pehlewî yê Îranê jî derkirin û li taravgehê bi nesaxî mir û cih nebû tê de çal bikin, li mala xezûrê wî li Misrê cihek bo wî peyda kirin!

Ez li nav xeyalan hatime derê û hatime nav rêûresmê, dubare hate bîra min ku di wê rêûresmê de hikûmeta koloniyalîstiya Tehranê navê şeqamekê kiriye bi Feleştîn û hin sînema û cihên teybet jî tê de hene ku navê wan kiriye Feleştîn, lê li heman cihê ku navê wê kiriye Feleştîn îznê nade rêûresmeke Kurdan ku xwediyê sereke û dîrokî yê wê mal û axê ye, bi rê ve here!

Bûyer ecêb in û Kurd dîrokek pir ji tirajêdî heye. Qîrar e rêûresmek Kurdane li salona Feleştînê bi rê ve here! Rê jî nadin bi rê ve here, jinek jî hatiye bo beşdariya wê rêûresmê ku ew jî, jina yekem Serkomarê Kurdistanê ye û Serkomar hatiye sêdare-dan û bi sedan gencên Kurdistanê jî hatine bo rêûresmê û dibihîzin ku jina Pêşewayê

nemir li vir e, hemû ronahiyek li çavê wan de xuya ye, tîrêjek ronahî di çavê wan de diçiriske ku ji tîrêja roja alaya Komarê ve çavkaniyê digire!

Dr. Qasimloyê nemir li ser Komara Kurdistanê û Pêşewa dibêje:

Komara Kurdistanê ew xortê tenê yê dîroka neteweya Kurd hate ciwanmergkirin, lê şûnwarê wê Komarê niha jî xuya ye... Civatgeha xelkê Kurdistanê bi wê hemû ezamûna ku destê wan kevtiye û bi peyrewîkirin li siyaseta rast û dirust a Hizba xwe, Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, rêya Pêşewa heta serê dibin û hêviyên bicihnehatî yên Komara Kurdistanê bi tevahî tînine gorê.



Stêrka Geş a Kurdan



N: Nûredîn Sofîzade

Di nava her welat û neteweyekê de, hin roj û bûyer hene ku dibine rojên dîrokî û cihê şanaziya wî welatî yan netewê.

Herçiqas di dîroka netewa Kurd de jî rojên wiha zaf in ku hemî netewa me şanaziyê pê diket, lê 2ê Rêbendanê rojek herî pîroz û girîng e di nava rojên dîrokî yên Kurdan de.

Li 2ê Rêbendana 1324 a (22ê Kanûna Paşîn a 1945an), li Rojhilatê Kurdistanê û li ser deştê Pêşewa Qazî Mihemed û ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdistanê ve, yekemîn dewleta Kurdî li sitadtoya kora Kurdistanê hate avakirin.

Di vê Komarê de û di bin deshîlata dewleta Kurdistanê de ku yekemîn car bû Kurdan dewletdariyek wiha diceribandin, gelek zû xuya bû ku gorî wî serdemî Komara Demokratîk a Kurdistanê, di nava hemî dewlet û welatên navça Rojhîlata Navîn de, deshîlat û hikûmetek herî pêşkevtî ye û dikare bibe sembola demokrasî û wekheviyê û deshîlatek dadperwerane.

Zêdebarê vê ku renge qewara deshîlata wê Komarê hemî axa Rojhilatê Kurdistanê jî negirtibû, lê her Kurdek heta li perçên din yên Kurdistanê jî, ev deshîlat û kîyan û Komara Kurdistanê bi ya xwe dizanîn û li hember paraştina wê de seh bi berpirsariyê dikirin, her eva bû ku ber avabûna Komarê ku amadekarî dihat kirin da ku bête ragihandin, û roja ragihandina Komarê û li 11 meh temenê nûciwane wê Komarê de û heya roja têkçûna Komarê, xwe li hember da berpirsariyê zanîn, û beşdar bûn û şerê paraştina wê kirin.



Renge gelek caran û çendîn pirtûk û hezaran gotar û axivtin li ser çawaniya avakirina Komara Kurdistanê hatibine weşandin ku çawan hate damezrandin û deskevtên wê çi bûn, sedemên avabûn û jinavçûna wê çi bûn, lê min hez kir di wê nivîsê de behsa pîroziya neteweyî ya 2ê Rêbendanê bikim.

Ew xalên ku 2ê Rêbendanê li cem hemî Kurdan kirine rojek herî pîroz a dîrokî û hemî Kurd şanaziyê pêve dikin ev in:

1 – Zêdebarê vê ku mixabin Kurdistan ji aliyê 4 dewletên dagîrkar ve hatiye perçe perçekirin û her kîjan ji wan perçên Kurdistanê di bin dagîrkariya Îran, Turkiye, Îraq û Sûriyê de ye, lê di dema avakirin û ragihandina Komara Kurdistanê an ku roja 2ê Rêbendanê de, li her 3 perçên din yên Kurdistanê li bajarê Mihabadê beşdar bûn, weke Nemir Barizani û hezaran kes ji şoreşvanên xwe, dehan kesayetî û rewşenbîrên Başûr, malbata şoreşvan a Nehrî û Seyîd Teha û şoreşvanên Geylanî li Bakurê Kurdistanê, dehnan kesayetî û rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê û li Rojhilatê Kurdistanê û wan herêmên ku di bin deshîlata Komara Kurdistanê de nebûn wekî Kirmaşan, Îlam, Hewraman, Hemedan û... hwd

2- Raşt e ku Komara Kurdistanê li ser parek ji axa Rojhilatê Kurdistanê hatibû avakirin, lê bona birêvebirin û karên wê dewleta Kurdî, ew yeke qet nebû pîver ku deshî-

latdar divê xelkê wê para ji axa rizgar kiribin, belkî neteweyîbûn û Kurdistanîbûna wê deskevt a Kurdan li wir de bû ku gorî lêhatîbûnê û hewcehiyê deshîlat û karê birêveberiya Komarê bi wan Kurdanan re hatibû spartin ku ji perçên din yên Kurdistanê ve li Komarê de beşdar bûn; bo mînak Nemiran Mela Mîstefa Barizani û dehan kesên din xelkê Başûr û Seyîd Teha Şemzîni û dehan kes li Bakurê Kurdistanê berpirsariyê herî bilî bi deşt girtibûn û dehan nivîskar û edîb û rewşenbîrên Başûr û Rojavayê Kurdistanê şewirdarên Komarê li warê rojnamevanî û perwerdehî û çapemenî de erk pê hatibûne spartin û Komara Kurdistanê li çarçêve û qorixa Rojhilatê Kurdistanê de nemabû.

3- Piştî derbasbûna li ser nemana Komara Kurdistanê heya îro rojê ne tenê li Rojhilatê Kurdistanê, belkî li her der û her kîjan ji perçên din yên nîştîmanê, her kes xwe xwediyê wê deştekevt a Kurdan dizane û dilê wan bo avakirina ji nû ve ya Komar û deskevtêke bi vî awayî lêdide. Eva jî li merasim û yadkirinên hemî salê li her çar perçên Kurdistanê û ji aliyê her rêkxistin û hizbeke Kurdî ku hilgirê çi bîr û bawerekê be, neteweyîbûn û pîroziya Komara Kurdistanê dide xuyakirin.

4- Ji bona paraştina Komarê xwîna egît û şoreşvanên her çar perçên Kurdistanê rijîya ye ser axa Rojhilat û her ew xwînanene ku tevî hev bûne û hêvîyê neteweyîbûna Ko-

mara Kurdistanê çê kirine. Belê ev 4 xalên serwe ez bawer im têra dîke ku mirov bikare bêje Komar û 2ê Rêbendanê li ber vê ku ya hemî Kurdan e, renge çi rojêke dîrokî yên Kurdan bi qasî 2ê Rêbendanê bi yek deştî û bê ferq û cudahî li her çar perçên Kurdistanê de pîroz nebe, ez wê gotinê bi xatircemî ve dibêjim ku ti rojek hindî roja avabûna Komara Kurdistanê bal hemî Kurdan pîroz nîne. Sedemên sereke yê pîrozbûn û netewîbûna Komarê jî, renge ew 4 xalên serwe bin. Renge li hemî perçên Kurdistanê deskevt û guhartin û rojên dîrokî hebin, lê bi qasê yekdeştîya li ser 2ê Rêbendanê, netewa me hemî xwe xwediyê wê dîrokê nizane û bi bîr nayîne, ew jî vedigere ser vê yekê ku hemî Kurdan hevşeweya Komarê yan rolê de tinebûne, yan ev bûyer û roja dîrokî li qorixa part û perçeyê Kurdistanê de mabe.

Lewra ne Hizba Demokrat wekî avakerê Komara Kurdistanê, ne xelkê Rojhilatê Kurdistanê Komara Kurdistanê tenê bi ya xwe nezanîne û qet bi wê yekê jî nerehet û dilsar nebûne ku dema li perçeyekî din yên Kurdistanê, yan ji aliyê part û aliyên siyasî ve yada Komarê tê pîrozkirin, ti amajeyek bi wê hindê nakin ku erê gelo ev Komare ji aliyê kê û kîjan partiyê ve hate damezrandin, PDKÎ û Rojhilat, şanaziyê dikin ku kar û deskevt a wan a dîrokî, bûye ya hemî Kurdan, îcar girîng nîne bila her navek ji wan neyê anîn. Ev yada netewî an ku 2ê Rêbendanê salvegera avakirina Komara Kurdistanê, ji her Kurdekî welatperwer ji malbatên xwedanqeder ên şehîdên Kurd û Kurdistanê, ji her Kurdek ku dilê wî bo avakirina Komara Kurdistanê lêdide û ji her rêvîngekî rasteqîne yê rêbaza Komarê û li Hizba damezrênerê Komarê an ku PDKÎ pîroz be. Bi hêviya bideştvehatina carek din a Komara Kurdistanê.

Paşeroja nasiyonalîzma Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê de



N: Mardîn Rehîmnîjad

W: Hesen Mukerem

Îmkan tine ye ku em behsa nasiyonalîzma Kurd tenê bo parçeyê Kurdistanê bikin. Nasiyonalîzma Kurdî ya her çar parçeyên Kurdistanê ye û behsa welatekê dike ku ji çar aliyan ve hatiye dagîrkirin. Lê belê, mîna heqîqetê nasiyonalîzma Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de gelek bihêztir û gelek jî kurdane ye li çav parçeyên din. Kurdên Rojhilatê bo hemû parçeyên din yê Kurdistanê qurbanî dane û herwisa di xweşî û nexweşiyên parçeyên din yê Kurdistanê de pişkdar bûne. Kurdên Rojhilatê hinek caran ev jîrbûna jî hene ku şaştiyan vediguhezî û paşekêşiyê bi faşîzma Îranê didin kirin.

Lêbelê, bi awayekî giştî dibe ku em bipirsin gelo heta niha nasiyonalîzma Kurd di encama kiryarên xwe de serkeftî bûye? Eger serkeftî nebûye sedemên sernekeftina vê çi bûne? Sedem û givaşên derêkî ne an jî navxweyî ne an jî şaştiyên me bixwe ne?

Ti pirsek siyasî bi bêhebûna bandora rewşa navxweyî û derve nayê şirovekirin. Bêguman rewşa Rojhilata Navîn bi giştî û rewşa navdewletî li ser gelê Kurd bandor heye. Lê, eva ku ji her tiştî zêdetir derbe li Kurd xîştîye, Kurd bixwe ye. Heta niha jî li ser armancên xwe sax nebûye. Carê hindêk sînorên piçûk piçûk hene ku bûne bi sedema çêbûna dîskursek bihêz ya neteweyî û bêreng nebûne. Carê em dixwazin bi amûrên serdemên sedsalên 19'an, di sedsalên 20'an de serkeftiyê şer bin. Em dibe di stratîjiya neteweyî de xwe yekalî bikin. Dema ku em bûn bi aliyek, dê amûrên hewce jî bo dabîn bikin.



Şoreşên serkeftî xwediyê çendîn tiştan bûne ku dibe me jî hebin:

- Stratîjiya destnîşankirî ku armanca giştî ya şoreşê ye.
- Komek taktîk ku ev taktîkane di dema guncav de, bo parastina stratîjiyê hem dîkin bi qurbanî hem jî bi hêsanî guherînkari li ser de pêk tên.
- Rêberê jîr, zana, netirs û xwedî piroje.

- Hêza mirovî ya ku di hemî rehendan de hatiye perwerdekirin. Şoreş ji teorîzanek, fermandeyek leşkerî û çavnetirs û şirovekarekî ve big-

ire heta laşfiroşekê ku karê sîxûriyê jê re dike hewcehî pê heye, bi şert û mercên ku ev rola ku dilîze û mebest ji vê pêngava ku diavêje serxistina şoreşê be.


- Çekên nû bo pêşmerge, li ser rûyê erdê ti hêzeke leşkerî tineye da ku bi bê hebûna hêza leşkerî bikare dîplomasiyê serkeftiyane hebe. Bo vê mînakê Welatên Yekgirtî yê Amerîkayê bînine berçav ku ew tenê xwediyê hêza çar rehendî ya cîhanê ye, eger hêza leşkerî ya vê jê biştînin, dê bikare kîjan yek ji pîlanên xwe cî bi cî bike? Îcar eger aliyê beramberê te welatek be ku tijî be li faşîzim, tundîtîjiyên mesebî û bi şewaza gulle û şûr digel te bi xwe û herwisa rêberê te li ser maseya gotûbêjê jî teror bike! Gelo ti hêviyek heye ku bikarî bi peyvê bigihîjinî bi qinaetê ku rêz ji mafên te bigire? Derheq mijra çekê de jî, em dibe vê yekê bizanin ku çeka Kilaşnikofê şiyana şerê beramber balafirê tineye û dibe ciwanên xwedî hêz û şiyanan ji bona hînbûna vê zanîstê han bide, û bitaybet bo balafira bê pilot û ...hwd.

- Hêza aborî çavkaniya tev hêzên din e. Bi bêhebûna hêza aborî ti yek ji hêzên din yê te bihêz nabin. Eger di heyama wan salên derbazbûyî de ku partiyên rojhilat yê Kurd xebata çekdariya xwe bi her hêcetekê be dane sekinandin lê, eger bo di-

ruştkirina çavkaniyên aborî hewl û têkoşîn kiribin, niha bi xatircemî ve hem li Ewropa û hem jî li Amerîkayê dibû xwediyê çendîn kompaniyayên mezin ku her sal çendîn milyon Dolar pere bo bihêzbûna xebata rizgariya neteweyî ya gelê Kurd dabîn dikir. Mixabin karekî wuha nehatiye encamdanê, lê ez li ser vê baweriyê me ku dibe bilezigîni dest bi vî karî bike.

- Karê medyayî û piropagandeyî yek ji karên bingeîn û hewce yê her şoreşekê ye. Piropagandekirin zanabûn û jîrbûnê dixwaze û dibe çendîn pisporên taybet bi şirovekirina naveroka te hebin (tehlîl muhteva) bona hebûna bandora peyamên te û herwisa şirovekirina naveroka peyamên dijmînen te. Eger em kêmasiyên xwe kêmbikin, dema ku em dibînin ku neteweya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de tîniyê azadî û bi dawîanîna koletiyê ye, nasionalîsta Kurd li Rojhilatê Kurdistanê li gor parçên din ên Kurdistanê serkeftîr dibe.

Di dawiyê de jî, vê yekê bibêjim em bona ku pêngavên baştir hilgirin, dibe bi awayekî berdewam bi çavekî rexne û gazindekirinê çav li xwe bikin. Çimkî eniya xebata me ber bi aliyê pêş ve ye û azadî, demokrasî û mafê mirovî dawî armancên me ne, her ji ber vê yekê ye ku dibe bi vî karakterî jî pêşwaziya rexnegirtinê dilsozane bikin.



Dijberên du zimanî çî dibêjin?



N: Bêhzad Qadirî


W: Hesen Mukerem

Ziman ji komêk hêmayan pêk hatiye ku wateyê digihîne mebestê. Tevî vê yekê jî, rêziman û çawaniya pêkhateya wan hêmayane jî digihîjine bi vê mebestê. Ev rêzimana alîkariyê dide tak da ku, şiyana berhemanîna peyamên zêde hebe.

Mirov canjiberek e ku bi mifahvergirtin ji sîstemeke gelek pêşkevî ya pêwendîgirtin ji canjiberên din tene cudakirin. Ev sîstema vê şiyane dide bi mirov da ku bikare zaniyariyên derdorê kom bike û bigihîne bi mebestekê.

Ziman xwediyê du karkerên bingehîn bo mirov e. Yekem ev e ku ev şiyane daye bi me da ku digel mirovên din pêwendî bigirin û bi vî awayî zaniyarî, dîtingeh û hizirên xwe bighînin bi mibestê an jî, hemen tiştê li kesên duyem verbigire û duyem karker jî ev e ku hizirkirin bo me rêk xistiye.

Yek ji wan mijarên ku gelek ji mêj ve xelkê bawerî pê hebûye, hizira piroseyek e ku piştî xwa bi ziman girêdaye. Êştayinbêrg di pirtûka xwe ya bi navê “Derûn-nasiya Ziman” de raman û komêk hizirên zaniştî ku bi baweriya wan hizirê piştî xwe bi ziman girêdaye, li ser çar girûpan parve dike û ev jî wuha ne: 1- Girûpek li ser vê baweriyê ne ku berhemên ziman û reftarên din, hin tişt in ku jêrxana hizirê pêk tîne. 2- Girûpek li ser vê bawerê ne ku ziman jêrxana bingehîn a hizirê ye. 3- Girûpek din li ser vê baweriyê ne ku sîstema ziman û rêzmaniya her takekê, şewaza dîtingeha



wî/wê takê derheq bi cîhanê destnîşan dike. 4- Herwisa girûpek li ser vê baweriyê, sîstema ziman û rêzmaniya her takekê, ferhenga wî/wê takê destnîşan dike.

Pêka vê destpêkê û girêdana hizir û ziman bi hev re, em Kurd rûbirûyê pirsê du zimanî dibin. Wate zimanê dayîkê yê me Kurdî ye û me neçar bi du zimanîyê dikin. Lê belê, pirsîyara me ev e:

Dijberên du zimanî çî dibêjin?

Gelek li derûnas û civaknas li dijî diyardeya du zimanî ne û du ziman weke astengekî li hember vegeşiyana naskirinê de dizanin û dibêjin di axavtinê de dibe sedema çêbûna arîşeyan. Ev li ser vê baweriyê ne ku ev hizira nedirûst ku zarok pêş li temenê Pênç saliya xwe de dikare zimanê biyaniyan weke zimanê dayîka xwe hînî bibe. Ev hizira şaşbûye sedemê vê yekê ku hin ji dêv û bav hevdem digel zimanê dayîkê, zimanek biyanî hînî zarokên xwe bikin. Mixabin, ev diyardeya jî heye ku hind ji malbatên Kurdan heta digel zarokên xwe bi zimanê dayîkê naaxvin û zimanê Farsî bûye zimanê nav malbatê de jî. Ev mijara han dibe sedema vê yekê da ku di hundirê zarokan de hizirek çê bibe ku mijara bi zimanê dayîka xwe ji kesekî re bêje ku hemen mijarê bi zimanê bihaniyan ji kesekî din re

bêje, di raştiyê de, ev kiriyara han dibe sedemê paremayîna qonaxa neaxivtinê di hundirî zarok de.

Cudagiya rêzimanan di zimanan de, dibe sedemê arîşê û nerêkiyê di hizirkirinê de jî. Bi beraxwedana bi vê yekê ku karê han wate fêrbûna zimanê dayîkê hemkofê zimanê bêgane ye heta bo dersxwanên astên serê jî zehmet e, û me digihîjne bi vê encamê ku zarokek kêmtemen di heyama fêrbûna zimanê hemkofê zimanê dayîkê û zimanek bêgane de, tûşî çî erêk giran bibe. Li serhev zarok di dema axavtina bi du zimanan, wan digel yekitr tevlihev dike û heta heyamek dûr û dirêj nikare wan ji yekitr cuda bike.

Dijberên du zimanî îşare bi gelek lêkolînên cuda dikin da ku nerîn û ramanên xwe bînine ziman û herwisa ev li ser vê baweriyê ne ku di destpêka axavtinê de, bi

awayekî giştî hebûna bandora du zimanî berçav nîne lê belê, bi derbasbûna demê hêdî hêdî bandorên neyînî ên vê der dikevin... Ji aliyekî din ve jî, nebûna şiyane di axavtina guncaw ya mijaran de, ji aliyê zarokên du zimanî ve, nîgeraniyê çê dike. Her bi vê sedemê jî, zarokên du zimanî di dema xwendinê de digel komêk astengiyan rû bi rû dibin û bi dijwarî serkevtî dibin.

Bandora neyînî ya du zimanî ya li ser warê derûnî û civakiya zarokan zêdetre e ji serkevtina di qonaxa xwendinê de. Wate zarokên du zimanî bi sedema anîna ziman ya neguncaw a mijaran û peyvên di axavtinê de raştî henekên hevalên xwe dibin û encama vê rewşê jî kerb û kîn û xemokî li pey xwe hedibe. Herwisa ev yek dibe sedema vê ku zarokên han xwe di axavtina digel kesên derdor, xwe dûr bigirin û her ev yek jî, li ser tevavbûna kesayetiya wan bandora neyînî datîne. Ev lêkolerên han, behsa vê yekê dikin ku ev zaroka ku di destpêka fêrbûna ziman de fêrê zimanê bihanî bibe, şûnda digel komêk astengiyan bingehîn rû bi rû dibe.

Di dawiyê de em digihîjin vê encamê ku perwerde û hinkirina zarokên Kurd di Kurdistanê de bi zimanekî din bilî zimanê Kurdî, mezintîn zilme hem derheq wan û hem jî derheq neteweya wan de.



Devera Nûdişe û cugrafiya vê

N: Rojnameya Agirî

Nûdişe bajarekî piçûk e û girêdayê Hewramana Lihon e û di navbera sînoren destkird yên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê û di 150 kîlometriya parêzgeha Kirmaşanê, li 32 kîlometriya bajarê Pawe hilkevtiye. Di heyama sala 1322'an de, piştî parvekirinên îdarî-siyasî weke bajêr ser bi bexşdariya bajarê Newsûdê hate hesabkirin. Ji aliyê bakûr ve bajarê Nûdişe digel bajarê Merîwan û ji aliyê rojava ve jî, digel bajarê Newsûdê û herwisa ji aliyê bajarên rojhilat yên Herêma Kurdistanê ve jî, digel bajarên weke "Helebce û Bi-yare" hevsînor be.

Bajarê Nûdişe di navbera çiyayên bilind û geliyên kûr û tengav de hilkevtiye ku bi girê Mahura Bextyar tê naskirin û derdora wî bi darên weke Berû û Qezwan û kaniyan hatiye xemlandin. Ev bajara 145 metran li asta behrê bilind e. Salane navînciya barîna baranê di vê deverê de, digihîje 500 heta 600 mîlîmetran û herwisa xwediyê av û hewayeke dariştanî ye.

Pêka dawîn serhejmariyên ku di sala 1395'an de hatine encamdan, nifûsa wî bajarî 3683 kes e. Pitr ji hezar malbatên bajarê Nûdişe di bajarên din yên Rojhilatê Kurdistanê de yên weke Pawe, Merîwan, Sine, Rewanser û Ciwanroyê rûniştî ne. Herwisa xwandekarên bajarê Nûdişe di bajarên mezin yên Îranê yên weke Tehranê de niştêcî bûne û her vir jiyana xwe derbas dikin.

Nûdişe Bajarekî çiyayî ye û malbendeke kevin û dîrokî ye ku nîva cih û çiyayên wî kevin û xwedî dîrok in. Bajarê Nûdişe cihê xanên Lihonan e û girîngiyeke taybet bo navçeya Hewramanê heye. Nêzî 10 kolanên kevin û xweddî dîrok di nav bajêr de cih digirin ku navên wan wuha ne: Qela, Bin Duga, Milega, Roqin, Lamera,



Baxçe, Derevmesûra û Kavindan. Her yek ji wan kolanên ji rûyê devokên berê ve wate û taybetmendiyên xwe hene û ev yeka jî nîşaneyên dîrokîbûna kultûr û nîştêcîbûna civaka wî bajarî ye.

Peyva Nûdişe bi wateya "Nevdij" an jî "Dije Nû" tê. Xelkê wî bajarî bi devoka Hewramî ya zimanê Kurdî diaxivin.

Çiya û şikeft

Çiyayên bajarê Nûdişe, bedevî û taybemendiyek bi avahîçêkirina wî bajarî daye û herwisa li ser jiyana û civaka herêmê bandor hebûye. Nûdişe di navbera çiyayan de asê ye, çiyayê Derbend li bakur bi bilindahiya 2750 metran, çiyayê Kemacer, Şexle û Çinar ji aliyê başûr ve 1800 heta 1900 metran û çiyayê Şimş jî, bi bilindahiya 2100 metran ji aliyê rojava ve. Herwisa dola bedev ya bajarê Nûdişe, ji aliyê rojhilat ve digihîje nav geliyê Sîrwan û çiyayê Şaho jî, bi bilindahiya 3410 metran li rojhilatê bajêr hilkevtiye.

Şikefta Qajeliyan ji aliyê bakurê rojhilatê bajêr li çiyayê Derbend hilkevtiye ku dirêjahiya vê bi qasî 85 metran e û herwisa talarek bi panahiya 25 metran û bilindahiya 16 metran heye.

Dallanî

Seyrangeha Dallan di 13 kîlometriya bajarê Nûdişe

hilkevtiye, û bilindahiya wê 1600 metr e. Bi sedama bêhna gola Dallan û kaniyên wê, ew cem geştiyaran navûdengêk taybet bi xwe heye. Rêya Tete ku bi qasî 1700 metran li asta behrê bilind e û li bajarê Nûdişe destpê dike û ji nav Dallanê derbas dibe heta digihîje gerdena Jalaneya Hewramanê ku ji vir de ber bi aliyê rêya bajarê Merîwanê heta digihîje wî bajarî çendîn gund û seyrangehên taybet derbas dike.

Bendava Daryan

Bendavek e ku li ser ava geliyê Sîrwan û bi heriyê hatiye çêkirin, herwisa asta bilindahiya vê 155 metr e û li nêzîk gundên weke Wira, Dariyan û Hecîc hilevte, û herwisa çendîn hiktar dariştan, gundên navçeyê û kaniya Binllî bin av kiriye. Pêka lêkolînên şareza yên wî warî, bendava Dariyan metirsiya xîstiyê ser kaniya Billê û di demeke dirêj de bi tevahî ji nav dibe.

Kaniya Bill

Kaniyek siruştî ye ku li nêz gundê Hecîcê hilkevte û li çiyayên weke Şaho û zincîre çiyayên Zagîrosê serçaveyê verdigre. Ev kaniya bo xelkê herêma Hewramanê taybetmendî û berdiliyek zêde heye. Kaniya Bill mezintrîn kaniya Kurdistanê ye ku di xûlekê de 4 hezar lître av jê derdikeve û şiyana dabînkirina ava vexwarina 2 milyon kes heye.

Nûdişe û Kurdayetî

Hewramana serbilind her wekî navçeyên din yên Kurdistanê, ji mêj ve heyna nasname û bilindragirtina berjewendiyên neteweyîtiya xwe ye. Di vê navberê de bajarê Nûdişeya nîştimanperwer, her di destpêka şoreşa gelên Îranê de, li dijî rejîma paşayetî mil bi milê bajarên din yên Kurdistanê alaya xebata neteweyîtiyê bilind kiriye û herwisa piştî ragihandina xebata eşkere ya Partiya Demokrat hemû çîn û qatên bajarê Nûdişe bi pêşwaziya bangeşeya Hizbê ve çûn û kom bi kom ciwanên xwedî heşt ên nîştiman, çeka şeref û Kurdayetiyê avêtin milê xwe û zêdetr ji çend sed kes tevî şoreşê bûn û bûn bi endam û pêşmergek Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê.

Pêşmergek Nûdişe li komîteya bajarê Pawe û di hêza dijmnîşiken ya Şaho de hatin rêxistinîkirin û heta dema ku bajarê Nûdişe li ser biryara Partiya Demokrat ji ber paraştina canê xelkê sivîl li hember dirindeyî û gefa bombebarana rejîma Axûndî hate valakirin. Û bi awayekî qehremanane li hember hêza Sapha Pasdaran û xwefiroşan berxwedanî kirin û di çendîn navçeyên Hewramanê de jî, destanrîsiyên jibîrnekirî afirandin û her li vê rêbazê de jî, çendîn fermande û pêşmergek canliserdest rih û jiyana xwe pêkêşî baregeha azadî û Kurdayetiyê kirine.

Nerîna Lîderan



“Anthony Blinken”:

“Em nikarin garantiya man li Ber-camê bidin”.



“Jean-Yves Le Drian”:

“Danûstandina zîndîkirina Ber-camê gelek bi lawazî ber bi pêş ve diçe û em nikarin bi vî awayî bidomînin”.



“Benny Gantz”:

“Zilhêzên cîhanî tevî vê ku derheq bernamêya Navkî digel rejîma Îranê danûstandinê dîkin, divê li ser reftara dujminkarane û piştewaniya wê rejîmê ji girûpên terorîstî di deverê de jî gengeşeyê bikin”.



“Mezlûm Kobanî”:

“Rizgarkirina Efrînê ji karên me yên pêşîn e”.

Qasim Sulêmanî û kerê mele Nesredîn



N: Selam Îsmâîlpûr

Berî du heftiyan peykerê çêkirî yê Qasim Sulêmanî serkirdeyê têrorîst ê berê yê Sipaha Pasdarên rejîma Tehranê ji aliyê xelkê Şarkurd ve hate şewitandin. Şarkur ku bixwe navenda parêzgeha Bextiyarî ye, di 40 salên derbasbûyî de û bi taybetî jî di serdema şerê di navbera Îran û Îraqê de, bi lihemberdana ligel navçeyên din ên Îranê zêdetirîn piştewanî li rejîma Komara Îslamî kiriye û kêmîrîn pirsgerêkên wan bi rejîmê re hebûn.

Niha êdî ev xelk jî, Qasim Sulêmanî weke leheng binav nake û nikarin peykerê wî jî li nav bajarê xwe qebûl bikin. Lê belê di nav Kurdan de, hin siyasetvan, kesên bazarî, şêx, lat û lût, nivîskar û fermanîdar jî hene ku ne tenê nasnava Serdar û Şehîd didin wî, lê belê wî dîkin Serwer û Şehîdê Riya Aştî û Rizgariya Kurdistanê.

Lê tiştê rast ev e ku Qasim Sulêmanî, ti caran lehengê bi xîret û fermanîdarê wêrek û bêhempa yê pilandanî û zanişta serbazî nebûye. Lê mixabin wî, odeyên mejiyên hin karakterên siyasî yên Kurd û bi taybetî yên Başûrê Kurdistanê dagir kirine. Ji bo selmandina vê raştiyê hin mînak bes in;

Qasim Sulêmanî berî şoreşa sala 1979an yek ji wan lat û lûtan bû ku pişt re di Komîteyên Şoreşê de û ji aliyê Sipaha Pasdaran ve hatin rêkxistin û ji bo tepeserkirin û bédengkirina xelkê nerazî û ji bo kuştina xelkê serhildêr bo navçeyên wek Kurdistanê hate birêkirin. Ew beşdarî ti

akademiyeke serbazî nebû û şarezayê pilandanî û fermanîdariyê nebû. Weke gelek ji kesên wek xwe di nav Sipahê de ji nişkî ve ji ber çeqokêşbûnê û kuştina sivîlan, bû fermanîdarê serbazî.

Di şer û berevaniya xelkê Kurdistanê de ji bo paraştina navçeyên xwe, ew li hemberî wa derket û di êrîşa hovane ya çekdarên Îranê de li hemberî xelkê Kurdistanê ew jî beşdar bû lê belê ti serkeftin li dijê hêza pêşmergeyên Kurdistanê bi deşt xwe ve neaxîn. Lewma jî rejîmê ti caran behsa wan şeran nekiriye.

Di şerê di navbera Îran û Îraqê de jî Qasim Sulêmanî berpîrsê du êrîşên Kerbelaya 4 û 5 ji bo girtina bajarê Besre bû ku bi hezaran Îranî ji ber nezaniya wî hatin kuştin û di van şeran de hatin kuştin. Ew du êrîş hatin têkbirin û lewma jî heya serdema Xatemi, di nav Sipaha Pasdaran de jî qet ti girîngiyek ji bo wî nedihat dayîn. Yan jî di raştî de girîngiya wî tinebû.

Mînakeke din jî êrîşa girtina Tikritê ji deştên çekdarên DAIŞê bû. Wê demê hejmara hêzên DAIŞê kêm bûn û lewma jî wî difikirî ewê bikarin bi hêsanî bajarê Tikritê kontrol bikin. Ji ber wê rejîma Îranê ew bajar wek semboleke girîng ji xwe re binav kir û Qasim Sulêmanî kire fermanîdarê vî şerî. Rejîma Îranê wê demê piropagendeyeke zêde ji bo wî şerî kir lê belê piştî zêdetirî mehekê, sedan Pasdar û Heşd hatin kuştin û hêzên Îraqî karîn bi alîkariya hêza esmanî ya Hevpeymanan deşt danîn ser wî bajarî.

Mînaka herî dawiyê jî şerê dagirkirina Kerkûkê piştî rêfrandomê bû. Di wî şerî de Qasim Sulêmanî fermanîdarê êrîşa ser Kurdistanê bû. Tevî ku Kerkûk hate dagirkirin lê belê Qasim Sulêmanî di vî şerî de li hemberî hêza Pêşmergeyên Kurdistanê serkeftî nebû. Wî ne li Pirdê û ne jî li xalên din ên şer

serkeftin bi deşt xwe ve neanî. Serkeftinên wan, tenê ji ber xiyaneta Kurdan bûn. Bi vî awayî derdikeve holê ku Qasim Sulêmanî, qet fermanîdayê şer ê bêhempa nebû lê belê navûdengê wî tenê ji ber kuştina xelkê bê tawan bû. Piştî dawîhatina şer jî wêneyên sêlfî bi wêraniyên piştî şer re digirtin û belav dikirin. Lê di raştî de ji bo wî ziyana şer ne girîng bû. Ji bo wî girîng nebû çend kes ji wan tene kuştin û çend kes ji aliyê hemberî wan.

Berovajî nerîna hin siyasiyên bêwec ên Başûr, kuştina wî ne kiriyareke têrorîstî bû lê belê gawek bû ji bo lawazkirina mijara şerxwazî û têrorê.

Ew ti caran serkirde û çalakvanê çepera hevkeşeyên siyasî li Rojhilata Navîn nebû. Lê belê ew bixwe û rejîma wî, moreyek ji şetrenca jêopolîtîk a Rûsiye û Amerîkayê bûn. Piştî dawîhatina berpîrsyaretîyê jî, weke serbazekî şetrencê ji leyîzê hate avêtin. Ew kesê bê bandor ê ku hin serkirdeyên Başûr wî weke wezîr binav dîkin.

Ew kesekî dijekurd bû ku bi bpdceyeke mezin hêsanî karî ji bo bicîkirina pilana zilhêzan dikir. Her kesî bi mebestekê ew mezin dikir. Ji Amerîkayê bigire heya Îranê. Di vî navberê de hin siyasiyên bêwec ên Başûr bawer kirin ku ew leheng e. Dema ku ew pesna wî didin, Îranî bixwe jî pê heyîrgirtî dimînin ji ber ku dizanin ew ne fermanîdarê pilandanî bû û ne jî lehengê meydanê. Lewma jî mikrofona û qelem ji xulamokên Xamineyî standine û ew zêdetir şarezayî pêşeya xulamokiyê ne.

Ew pesna wan li Qasim Sulêmanî, çirokeke Mele Menşûr (Mele Nisredîn) dide bîra mirov ku karî kerê xwe yê şil bi zehmet bi du Qiranan bifiroşe. Pişt re ew kesê ku ker kirîbû, ewqasî pesna wî kerî da, ku Mele bixwe jî bawer kir ew kerekî baş e. Lewma jî çû û heman ker bi sed Tumenan kirî.

Efrîn di nav 4 salên dagîrkerî û kurdkujiyê de



N: Ebdûlazîz Qasim

Bi çira kesek ya welatên civînên Aştanayê, Rûsiya, Tîrkiye û Îran, û ligel xemsariya civaka navdewletî, parçebûn û duberekiya hêzên kurdî, Tîrkiye bi deh hezaran çeteyên xwe yên terorîst ve, di 20'ê Çileyê Paşîna 2018'an de, bi tank û balafirên şer, êrîşî li ser navçeya Efrînê ya, rojavayê kurdiştanê kir û di 18.03.2018'an de ew navçe bi tewahî hate dagîrkerin.

Di heyama 4 salên dagîrkeriyê de, li Efrînê tawanên cuda cuda yên dije mirovî û şer revandin, dizî, talan, kuştin, barimte, fidiye, birîn û şewtandina daristan û zewiyên zeytûnan, dizîn û wêrankirina şûnwarên dîrokî, destdanîna li ser mal û milkên kurd û guhertina demografiya vir, ji aliyê artêşa Tîrkiye dagîrker û çeteyên wê yên terorîst ve, bi navên cuda cuda li dijî gelê kurd



bi awayekî sistematîk berdewam e, ku nêzîkî vê rewşê, pêka gotina romannivîs û nivîskarê navdar yê Fransî, yê bi navê, Victor Hugo tê berçav: her devera Tirk di nav de derbas dibe, wir her tiştî wêran dike".

Di 20'ê Çileyê Paşîna 2022'an de, nêzîkî 20 rêxistinên mafên mirov û medenî yên Sûrî û Kurdî, di nameyeke vekirî de, bo Nozha Şemimxan, balyoza Encûmena Mafên Mirov, Paulo Sergio Pinheiro, Serokê Komîsyona Navdewletî ya Lêpîrsînê li Sûrîyê, li gorî Peymanên Laheyê 1899-1907, 4 Peymanên Cenêv yên 1949'an, Zagona Roma ya bingeîn 1998'an, dax-

waza nasandina Tîrkiyê wekî hêzeke dagîrker û kar ji bo guheştina doseyan tawanên wê bo Dadgeha Tawanên Navdewletî bi rêya Encûmena Ewlekariya NY kiriye.

Di wê nameya vekirî de hatiye : "Çar sal li ser destpêkirina Efrînê, dagîrkeriya Tîrkiyê û kiryarên tirsandin, tawan û talankirina milk û samanên herêmê û niştecihên wê re derbas dibin, di demekê de ku, hê jî dewletên biryarderên cîhanê li hember vê dagîrkeriyê bêdeng in, bi awayekî ku em vê bêdengiyê fêm nakin û nikarin şirove bikin.

4 salên ku hê jî dewleta Tîrkiyê li ser plan û projeyên xwe yên metirsîdar li

ser Efrînê û şênîyên wê yên resen berdewam e, hewlên lipey hev ji bo tinekirina nasnameya Kurd ya herêmê (gel, ol, çand, mîrat...) bi awayên cuda cuda, ji koçberkirinê dest pê dike û dest biserde girtina erdên welatîyan, heta derbazî pakirina etnîkî, guhertina demografiya herêmê, sepandina zimanê tirkî û perê tirkî dibe ... hwd ku, berî dagîrkerinê, rêjeya niştecihên kurd li herêmê 96% bû, lê niha piştî koçberkirin û guhertina demografiyê, kêmtirî ji sedî 25 e, hevdem ligel bicihkirina bi hezaran malbatên çekdaran ji herêmên cuda yên Sûrîyê bi piştgiriya darayî ya komeleyên Kuweytî, Qeterî û Fîlîstînî yên girêdayî rêxistina cîhanî ya "Exwan Misilman" tundrew di bin navên karên xêrxwaziyê de ..".

Di dawîya nameyê de daxwaza bo bi dawîkirina dagîrkeriya Efrînê û navçeyên din yên Sûrîyê hatiye kirin, herwiha daxwaza radeştirina rêveberiya navçeyê bo rêveberiyek sîvîl ya ji nişteciyên navçeyê di bin çavdêriya NY de, heta dîtina çareseriyek siyasî ji kirîza Sûrîyê re li gorî biryara navdewletî ya 2254'an kiriye.

Yekîtiya Nivîskarên Kurdiştana Sûrîyê bi tundî binçavkirina Mamostaya Zimanê Kurdî Zara Mihemedî şermezar kir

Yekîtiya Nivîskarên Kurdiştana Sûrîyê 12ê Kanûna Paşîna 2022an bi weşana daxuyaniyekê bi tundî binçavkirina Mamostaya Zimanê Kurdî "Zara Mihemedî" şermezar kir.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Yekîtiya Nivîskarên Kurdiştana Sûrîyê bi tundî binçavkirin û zindankirina Mamostaya Zimanê Kurdî "Zara Mihemedî" bi destê rejîma Îranê ya kurdî û dagîrkeriswê û şermezar dike û daxwaza bidawîkirina tawanên rejîma Îranî yên dîr ji hemî yasayên mirovî li dijî gelê



Kurd dike û ji bo bi fermîkirina Zimanê Kurdî bi hemû zarav û şewezarên wê bang li rêxistin û saziyên mafên mirovan ên navdewletî û herêmî dike.

Yekîtiya Nivîskarên Kurdiştana Sûrîyê herdem piştgiriya hemû hewldanên paraştina nasname û çanda neteweyî ya gelê Kurd

li her navçeyeke Kurdiştanê dike û herwisa piştgiriya kempeyna Zimanê Kurdî li Rojhilatê Kurdiştanê dike, ku mafek xwezayî yê gelê me ye, lewra ji bo perwerdekirin û fêrkirina zarokên me bi zimanê xwe yê dayîkê destxweşiyê li Zara Mihemedî û hemû mamosteyên Zimanê Kurdî dike.

Azadî bo Zara Mihemedî
Bijî Kurd
Bijî Kurdiştan
Her bijî Zimanê Kurdî

Yekîtiya Nivîskarên Kurdiştana Sûrîyê
Qamişlo

Kolberên Kurd bona peydakirina paryek nan dibe canê xwe bikin gorî

Li gor nûçeya ku Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê belav kiriye, Roja Înê 24`ê Befranbarê, hêzên leşkerî yên rejîma Îranê li ser sînorê bajarê Bane, teqe ji desteyek kolberên Kurd kirin û di encamê de koberê Kurd yê bi navê “Mêhran Rehmanî” temen 23 sal û kurê Xefûr, xelkê gundê “Menîcelan”ê canê xwe jideşt da, û kolber-ekî din yên bi navê, “Îbrahîm Rehmanî” jî, bi dijwarî birîndar bûye.


Kurdpayê daye zanîn, hêzên leşkerî yên rejîma Îranê,

ew du kolberên kurd digel destyek kolberên din bi bê agehdarkirina berê, teqeya raşteraşt ji wan kirine.

Herwisa hêzên leşkerî yên rejîmê, ew du kolberên Kurd di dema zivirînê de, bi bê ku tiştek digel wan hebe, ew raştî gullereşandinê anîne.

Îbrahîm Rehmanî xalê Mêhran Rehmanî ye, û herdu jî xwediyê zarokan in û Mêhran ee demek kurt e ku jiyana hevpar pêk aniye

Di vê bûyerê de, Îbrahîm



Rehmanî bi dijwarî birîndar dibe û bona çareseriyên pizîşkî navbirî bo navenda dermanî veguhaştine.

Herwisa roja Pêncşemî 23`ê Befranbarê jî, li bajarê Urmiye sê kolberên kurd bona dabînkirina debara jiyana xwe, bera xwe dabûne sînorê Turkiye û li tirsê hêzên leşkerî ên rejîmê rêya xwe wunda dikin heta niha jî bêçarenivîs in.

Nerizayetiya bikarhênerê torên civakî bi sedema sepan-dina cezayê îdamkirina jîngehvanek Kirmaşanî



Di heyama çend rojên derbasbûyî de, piştî piştraştîkirina cezayê îdamkirinê bi ser jîngehvanek xelkê bajarê Kirmaşanê yê bi navê “Birûmend Necefi” ji aliyê Dîwana Bilind a welat, ew cezaye nerizayetiya hejmarek ji bikarhênerên Twîtir û werzişvanan li pey xwe aniye.


Bikarhênerên torên civakî bi rêkxiştina heştêga “çavên can-jiberên jîngeha welatê me, nîgeranê jîngehvanê Kirmaşanî ye”; dijayetiya xwe li derheq îdamkirina wî jîngehvanê nîşan dane. “Elî Dayî” rahênerê futbolê li ser storiya Înîstagrama xwe, bi bilavkirina wêneya wî jîngehvanê Kirmaşanî, nerizayetiya xwe lei derheq wê cezayê nîşan da.

Herwisa lîstikvanê Kurd ê bi navê “Vuriya Xefûrî”, li ser Ti-wîtira xwe, ew heştêga nivîsiye “na bo îdamkirina Birûmend Necefi”.

Rêkevtî 14ê Gelawêja sala 1399an, li encama pevçûna 4 nêçîrvanên neyasayî digel jîngehvanan li debara Bêstûna bajarê Kirmaşanê, yek ji wan nêçîrvanan hate birîndarkirin û piştî canê xwe ji deşt dabû.

Heftiya derbasbûyî cezayê îdamkirina “Birûmend Necefi” ji aliyê Dîwana Bilind a welat ve hatibû piştraştîkirin.

Li girtîgeha Navendî ya bajarê Îlamê sê girtî hatin bidarvekirin



Sibêdeha roja Pêncşemî 30`ê Befranbarê, di girtîgeha Navendî ya bajarê Îlamê de, sê girtiyên bi navên “Hamid Menûçêhrî”, “Mihemmed Kerîmnijad” û “Subhan Şuhanî” hatin bidarvekirin.

Pêka gotina çavkaniya agehdar di vê derheqê de, ew sê girtî bi tohmata “kuştina bizanebûn” hatibûne binçavkirin û piştî jî, ji aliyê dezgeha dadweriyê ya hikûmeta Îranê ve, cezaya îdamkirinê ji ser wan re hatibû birîn.

Herwisa wê çavkaniyê zêde jî kiriye ku: Di nav wan sê girtiyan de, “Hamid Menûçêhrî” xelkê bajarê Mêhranê ye.

Heta vê demê,, îdamkirina wan sê girtiyan, ji aliyê ti medyayên navxweyî yên Îranê û herwisa çavkaniyên fermî nehatiye ragihandin.

Niyan Reşad: “Min karî weke bileztirîn jin li kêbirkeya cîhanî ya navdewletî ya “Nighku” pileya yekem bi dest ve bînim”

Me li derheq werzişa “Cross-fit”ê digel jina Werzişvan û rahênana Kurd a Kurdistanê hevpeyvînek kir û wê di beşek hevpeyvînê de daye zanîn: “Keçên Kurdistanê gelek bihêz in, bi alxahîni ve di-karin li tev werzişan de rol hebin û serkevtî bin.”

H: Keyhan Mihemedînîjad



P: Destpê xwe bide nasîn û çawa bû ku te di warê werzişê de dest avêt bi çalakîkirinan?

B: Ez Niyan Reşad û xelkê bajarê Hewlêrê me û qehriman û rahênana leşciwaniyê me; Min di beşa Zanistê de dest bi xwendinê kir û paşê min sala 2016-2017 her li bajarê Hewlêrê kolej qedand û li beşa “Dîzeyna Hundirî” pileya yekem bi dest anî. Tevî vê ku li xwedndinê ez hertimî ji wan kesê ku pileyên yekem bi dest dianîn bûm, heza min pir li werzişa leşciwaniyê dihat, çimkî malbata min ji herdû aliyan ve piştevaniya min dikirin û lewma min karî di herdu waran de bigihime vê pileya niha ku tê de me; Lewma ez hertimî bi pileya yek sipasiya malbata xwe dikim û hertimî xwe deyndarê wan dizanim.

P: Heta niha te çend caran di kêbirkeyên cîhanî de beşdarî kiriye û pile bi dest ve aniyê?

B: Ez di sê kêbirkeyên qehrimanî de beşdar bûme û yekem car li Kurdistanê qehrimaniya “Cross-fit” bi rê ve çû ku min karî pileya yekem bi dest ve bînim û herwisa li qehrimaniya hêza leşciwaniya jinan hata lidarxistin û min karî li vir jî pileya yekem bi dest ve bînim. Li kêbirkêya cîhanî ya navdewletî ya “Nighku” bo yekem car ku li Hewlêrê bi rê ve çû û ez weke bileztirîn jin beşdar bûm û min karî pileya yekem li ser astê Hewlêrê bi dest bixim û li ser astê navdewletî jî pileya sêyem bi dest bînim. Herçiqas ev qehrimaniye bo bileziya bilindkirina giraniyê yan jî leşrêkiyê bû, lê min hez dikir weke keçek Hewlêrê beşdar bim, çimkî Kurdistan heta niha serbixwe nîne û jiber nearamiya deverê gelek nekariye li qehrimaniyên cîhanî beşdariyê bike, lê ez hêvîxwaz im ji niha şûn de li Kurdistanê zêdetir girîngiyê bi werzişa “Leşciwan”îya keçan bê dan da ku em jî bikarin li qehrimaniya derve û navxweyê de beşdariyê bikin û Alaya Kurdistanê nîşanê welatên cîhanê bidin.



P: Tu wek keçek werzişvan, werzişa “Cross-fit” di asta Kurdistanê de çawa dibînî?

B: Werzişa “Cross-fit” wek diyar heyameke gelek kême hatiye Kurdistanê, ez kêfxweş im ku keçan jî di vê werzişê de rol hene, lê hertimî pêwîst e karê zêdetir bo bê kirin da ku ji ya niha baştir be.



P: Gelo keçên Kurdistanê karîne di kêbirkeya “Cross-fit”ê de serkevtî bin û vê werzişê di Kurdistanê de berfireh bikin?

B: Keçên Kurdistanê gelek bihêz in, bi alxahîni ve di-karin li tev werzişan de rol hebin û serkevtî bin, belkî li hin cihan û welatan de jinan kêmtir derfet hebin bo kar û erkên giran, lê tev cîhan vê yekê dizane ku keçên Kurd ne tenê bi mêjî, belkî bi ceşte jî bişiyar in û digel hêza mêran de beranber in; Bo mînak em dibînin ku keçên Kurd pêşmerge ne û di giran û diwartirîn rahênanan de beşdariyê dikin, lewma çî li “Cross-fit”ê yan her werzişek din be keçên Kurd hertimî bişiyar in.



P: Bi giştî werziş li Kurdistanê di nav jinan de çende girîngî pê hatiye dan?

B: Niha li Kurdistanê hemû curên werzişê bo keçan ji ber dest in û girîngî pê hatiye dan, lê ya ku hewce ye zêdetir girîngî bo keçan pê bê dan, piştevanî û piştgîriya malbatên wan e bo vê ku zêdetir ber bi pêş ve herin û bi bê tirs li hemû qehrimaniyên navxweyî û cîhanî de beşdariyê bikin, çimkî werzişê çende hewcehî bi wize, masûlke û teknîkê heye evqas jî hewcehî bi hêza piştevanî û piştgîriya maddî û derûnî heye da ku tê de serkevtî bin.



Binpêkariyên mafê mirovî di Kurdistabnê de

Meriyem Sadiqî, çalakvana mafê jinan bi salek girtîgeha ragirtî hate cezadan

Roja Duşemî 27ê Befranbarê, çalakvanek mafê jinan a bi navê “Meriyem Sadiqî”, ji endamên Komîteya Hevahengî bo Pêkanîna Saziyên Kedkarî, ji aliyê taya 1 a dadgeha Şoreş a wî bajarî ve bi salek girtîgeha ragirtî hate cezadan.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, dadgehê ew endama Komîteya Hevahengî bo Pêkanîna Saziyên Kedkarî, bi tohmata “piropagende li dijî nizam”ê ceza da.

Roja Çarşemî 12ê Xezelwerê, “Meriyem Sadiqî”, çalakvana mafê jinan û endamê Komîteya Hevahengî bo alîkarîkirina damezraweyên kedkarî, bi danîna barimteyê ji “Kanûna Îslah û Terbiyet” a bajarê Sineyê hatibû azadkirin.

Roja Şemî 1ê Xezelwerê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî êrîş kirine ser mala wê çalakvana mafê jinan û navbirî binçav kiribûn.

“Meriyem Sadiqî” piştî bi dawîhatina heyama lêpîrsînê li yek ji girtîgehên ewlehî li bajarê Sineyê, bo “Kanûna Îslah û Terbiyet” a bajarê Sineyê hatibû veguhaştin.

Xalid Fireydûnî piştî 21 sal girtîgeh hate murexesiyê

Roja Yekşemî 26ê Befranbarê, girtiyek siyasî yê Kurd ê bi navê “Xalid Fireydûnî”, piştî 21 sal girtîgeh ji girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê hate murexesiyê.

Ew girtiyê siyasî di heyama binçavkirinê de yekem car e ku hatiye murexesiyê.

“Xalid Fireydûnî” û “Umer Feqîhpûr” 10ê Xermanana sala 1379an li yek ji gundên bajarê Pîranşehrê ji aliyê Spaha Pasdaran ve hatibûne binçavkirin û di dadgeha Şoreş ya bajarê Mihabadê de bi tohmata “Muharibe” ji rêya endambûn digel Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi îdamê hatibû cezadan û ew cezaye sala 1384an di dadgeha pêdaçûnê de bi girtîgeha heta hetayî hatibû kêmkirin.

Ew du girtiyên siyasî sala 1383an ji girtîgeha bajarê Mihabadê bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê hatibûne dîrxistin û di sala 1386an de jî bo girtîgeha Recayîşehr a bajarê Kerecê hatibûne durxistin.

Ew du girtiyên siyasî piştî 10 sal dîrxistin bi girtîgeha Recayîşehr a bajarê Kerecê, Xezelwera sala 1396an bo girtîgeha bajarê Urmiyê hatibûne veguhaştin.

Roja Duşemî 23ê Xakelêweya îsal, “Umer Feqîhpûr” girtiyê siyasî yê xelkê bajarê Bokaanê piştî 21 sal girtîgeh û piştî derçûna bexşnameya nû hate efûkirin û digel hejmarek girtiyên siyasî ji girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê hate azadkirin.



Husên Sa`idî ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Şemî 25ê Befranbarê, “Husên Sa`idî”, welatîyê xelkê bajarê Sonqor ê ser bi parêzgeha Kirmaşanê, di mala xwe de ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin.

Nûçegihaniya “Hêrana” di vê derheqê de ragihandiye: “Hêzên ewlehî dane zanîn ku navbirî bi tohmata “bêrêzî bi pîroziyan” li ser torên civakî ew binçav kirine. Piştî piştraştîkirina tohmata “Husên Sa`idî” di dadseraya giştî û Şoreşî ya wî bajarî de, bo girtîgeha Sonqor hatiye veguhaştin.

Dadsitana Giştî û Şoreşî ya bajarê Sonqorê jî li hevpeyvînekê digel yek ji medyayên xwecehî nûçeya tohmetên sepandî li dijî wî welatîyê yên wek “bêrêzî bi pîroziyan û pêxemberê Îslamê” ji rêya belavkirina nivîsekê li ser torên civakî piştraşt kirirye.

“Husên Sa`idî”, welatîyê temen 50 salî û xelkê bajarê Sonqor ji werzişvanên çalak li beşa revîn û çiyavaniya wî bajarî ye.



Vekolîna mal û zevtkirina telefona sê welatîyan ji aliyê hêzên ewlehî ve

Roja Yekşemî 26ê Befranbarê, mala sê welatîyên bi navên “Ferîd Perwaze”, “Ehmed Perwaze” û “Husên Nîkpêy” xelkê gundê “Nê” yê ser bi bajarê Merîwanê ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine vekolîn.

Pêka gotina çavkaniyek agehdar, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyek yasayî êrîş birine ser mala wan sê welatîyan û hewla vekolîna mala wan dan.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Hêzên ewlehî telefona wan sê welatîyan zevt kirine û digel xwe birine.”

Di heyama çend rojên derbasbûyî de, îdareya Îtîla`ata bajarê Merîwanê deşt avêtiye bi gazîkirina bikomel a welatîyên xelkê gundê “Nê”yê.

Hêzên ewlehî ji welatîyên ku hatinî gazîkirinê soznameya fermî li derheq birêvenebirina rêûresman li gundê “Nê” wer-girtine û gef ji wan xwarine ku li hegera pêbendnebûn bi wê soznameyê dê wan binçav bikin û bêxin girtîgehê.

Heman roja ku di sir û seqema Mehabadê de kincên xwe avêtin



Dezgeha Ragihandina Giştî ya PDKÎ

